Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1296 | 6-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

## Hejmara (26) a Kovara Şermola Derket

**Navenda Nûçeyan**

Hejmara (26) a kovara Şermola ya wêjeyî û çandî ku bi zimanê kurdî û erebî tê weşandin, derket.

Dosyaya vê hejmarê "Çapemeniya Kaxezî li Sûriyeya Nû" ye, li ser vê mijarê çend nivîskar û rewşenbîr nêrînên xwe anîn ziman..




"Raza serkeftin û domandina her rojname yan kovareke çapkirî, ew e ku polîtîkayên wê yên weşanê divê êşên civakê û kolana Sûriyeyê bidin ber çavê xwe, her wiha bibe dengê azad li hember polîtîkayên zordar an jî dûrxistinê ji aliyê her rêjîm an rêveberiyê ve û bibe amûrek ji bo yekkirina Sûriyên ji etnîk, ol û baweriyên cuda. Her wisa, divê atmosfereke çapemeniya azad hebe ji hemû gelên Sûriyeyê re, bi zimanên xwe yên dayikê (erebî, kurdî, sûryanî û hwd.) destûr hebe ku rojname û kovaran derxînin.

Krîza ku çapemeniya siyasî ya kaxezî li Sûriyeyê tê re derbas dibe, bi awayekî mezin bandorê li erk û misyonên wê yên ku pêwîst e xwedî bandor be li ser raya giştî, dike. Ji ber vê, em bi awayekî zû û cidî hewcedarên çareseriyên lezgîn in, ji bo ku em karibin vê rewşê derbas bikin û çapemeniya siyasî pêş bixin".

Her wiha di hejmarê de çend nivîsên wêjeyî û çandî ku ji aliyê nivîskarên Rojavayê Kurdistanê ve hatine nivîsîn, hene.

Hejmara (26) a kovara Şermola 184 rûpel in, bi kurdî û erebî hatiye çapkirin.

**Di beşa kurdî de ev berhem hene:**

**pêşekî**

- Rojnamegeriya Kaxezî li Sûriyeya Nû .. (Desteya Sernivîskariyê)

Dosyaya Hejmarê (Rojnamegeriya Kaxezî li Sûriyeya Nû)

- Despêka Rojnamegerî û Nivîsîna Kurmancî li Sûriyê.. (Berzo Mehmûd
- Komunîkasyon, Ragihandin û Dîroka Ragihandina Kurdî.. (Beşîr Mele Newaf)
- Di Serdema Lezbûnê de; Parastina Rojnamegeriya Kaxezî.. (Esma Mistefa)

**Hevpeyvîna Hejmarê**

- Li gel nivîskar Nêrgiz Ismayîl e (Hevpeyvîner: Aram Hesen)

**Lêkolîn**

- Ji helbestên Melayê Cizîrî: DÎSA JI NÛ BÊHAL E DIL .. (Diyar Bohtî)

**Pirtûk**

-Danasîna Romana"Dê û Dêmarî" .. (Siltana Eto)

**Wergeradin**

- 9 Helbestên Charles Simić .. (Azad Ekkaş)

**Huner**

-Birîn .. (Xelîl Tehlo)

-Sînemaya Kurdî.. Çeka Aştiyane .. (Hişyar Murad)

**Serbest**

-Bîrdoziya (teoriya) Nûjen a Wergerê .. (Osman Ehmed)

**Çîrok**

- Peyv Ji Êşê Herifîn.. (Necah Ibrahîm)

**Helbest**

- Hindek Tişt Wisa Man, Çimkî Kesî Çi li Ser Negot.. (Cîhad Mistefa)

## FERHENGA BIWÊJAN

**Di bin simbêlên xwe de derbas kir:**
- Bi dizî kir; kes pê nehesiya.

**Di bin kumê min de ye:**
- Ez zanim ka ew çi tişt e; ez wî baş nas dikim lê ez nabêjim.

**Di bin kumê min de ye, kumê min jî li serê min e:**
- Bi heman wateyê.

**Di devê xwe de dicû:**
- Gotinên xwe vekirî nabêje; binlam dike. Çawa ku şerm bike, yan bitirse wisa diaxive.

**Di erdê re kir:**
- Gotina xwe ji her kesî re nabêje; gotina xwe vedişêre.

**Di guhê min de got:**
- Ji min tenê re got; eşkere negot; ji min pêve ti kesî nebihîst; bi dizî got.

**Di guhê wî de xwend:**
- Bê ku ti kes bibihîze şîret lê kirin.

**Di xwe de ye:**
- Tiştên xwe dernayne der; tiştên xwe di zikê xwe de dihêle; bêdeng e; giran e.

**Dizan ji dizan dizî erd û ezman lerizî:**
- Di nava xwe de winda kirin; bi awayekî balkêş winda bû.

**Her du jî rûyê hev dişûn:**
- Her du jî hev diparêzin; kêmayiyên hev vedişêrin.

**Her du jî tûyî devê hev nakin:**
- Bi heman wateyê.

**Her kes nikare gustîlê veşêre:**
- Her kes nikare sirran veşêre; her kes nikare gotinan li cem xwe bihêle.

**Hê mişkê malê nebihîstiye:**
- Ti kes pê nehesiyaye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Şîrovekirina matçan bi Kurdî gaveke dîrokî ye'

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Şîrovekarê werzîşê Beşar Yûsiv da zanîn ku wî di du mehan de xwe hînî şîrovekirina bi zimanê Kurdî kir. Herwiha Yûsiv tekez kir ku şîrovekirina matçan bi zaravayê Kurmancî gaveke dîrokî ye û pêwîst e li Rojava piştgiriya wê ji hêla rojnamegeriyê ve were kirin.**


Şîrovekirina werzîşê bi zaravaya Kurmancî ji qadeke girîng a veguheztina bûyerên maçên goka piyan e. Hemû netewe xwedî tîm û yaneyên werzîşê ne, her neteweyek jî xwedî şîrovekarên werzîşê yên bispor in û bi zimanên xwe yên resen xebata şîrovekirinê dikin.

Lê neteweya Kurd li seranserî Kurdistanê ji ber qeydên li ser zimanê Kurdî û lawazbûna ziman, hem jî xebata kêm a ji bo pêşxistina zaravayê Kurmancî li seranserî Kurdistan û Rojava bi taybet, asta zimanê werzîşê bilind nebû. Li Rojavayê Kurdistanê bi hewldanekê şîrovekirina werzîşa maçên goka piyan, gavek hat avêtin, xwediyê vê gavê jî rojnamevan û şîrovekar Beşar Yûsiv e.

Derbarê şîrovekirina maçan bi zimanê Kurdî şîrovekar Beşar Yûsiv ji rojnameya me re axivî.

**'Bi dirêjahiya du mehan xwe fêrî şîrovekirina bi Kurdî kir'**

Beşar Yûsiv diyar kir ku wî di du mehan de xwe hînî şîrovekirina bi zimanê Kurdî kir û wiha got: "Ez rojnamevan û şîrokvekarê werzîşê ji bajarê Dêrikê me. Nêzî 25 sal in ku girêdayî werzîşê xebata nivîsandinê dikim, bi avabûna Ajansa Vedeng re min bi zimanê Erebî dest bi şîrovekirina



maçan kir, nivîsîna min di zimanê erebî de xurt e, her kesê ku min nas dike nasnavê Pênûsa Zêrîn li min dike, bi dehê caran min rapor girêdayî werzîşê li seranserî Sûriyê amade kirine û hevpeyvîn çêkirine. Ji despêka vê xebatê ve heta roja îro min 100 maç bi Erebî şîrove kirine. Lê piştî ruxandina rêjîma Baas derfet ji bo min çê bû ku bi zimanê dayîkê maçan şîrove bikim. Ji bo min ev yek gelekî zehmet bû, lê bi alîkariya hin hevalan min xwe fêrî zimanê Kurdî kir. Bi dirêjahiya du mehan min xwe hînî zimanê Kurdî kir û dest bi şîrovekirina maçan kir, berî niha min xebateke wiha nekiribû, lê tevî wiha jî min bi jêhatiyeke mezin dikarîbû hemû maçên Lehengiya Sûriyê ya Footballê ya Pêşerojê bi Kurmancî şîrove bikim."

**'Şîrovekirina maçan bi Kurdî gaveke dîrokî ye'**

Yûsiv da zanîn ku şîrovekirina maçan bi zaravayê Kurmancî gaveke dîrokî ye û wiha domand: "Cihê serfiraziyê ye ku yekem car û yekem kes bi zaravayê Kurmancî li ser asta Sûriyê, li Şamê di Satada Feyhaa maçan şîrove bikim. Ev yek gaveke dîrokî ye ku cara yekem li Şamê bi zimanê Kurdî şîroveyê li ser maçên goka piyan bikim. Di kar û xebata xwe de min gelek lîstikvanên Kurd yên bispor dan nasîn, ji ber ku ew Kurd in, hatine paşguhkirin, lewma min mafê wan ên windayî parast, nimûne Ehmed Feqe, Ridwan Şêx Hesen û gelek lîstikvanên Kurd weke wan hene. Di destpêkê de ji ber hin pirsgirêkên siyasî, astengî derketin, geleke kesan rexne û şerê me kirin, hem jî gelek kesan kêfxweşiya xwe anîn ser ziman û bûn piştgir ji me re. Piştî ku maç bi Kurdî hatin şîrovekirin lîstikvanên yaneyên din kêfxweşiya xwe ji bo heskirina zimanê Kurdî anîn ziman."

**'Divê li Rojava piştgiriya şîrovekirina bi Kurdî were kirin'**

Şîrovekarê werzîşê Beşar Yûsiv destnîşan kir ku divê li Rojavayê Kurdistanê piştgiriya şîrovekirina maçan bi zimanê Kurdî were kirin û wiha axivî: "Armanca me tevan ew e ku zimanê Kurdî were parastin û bibe zimanekî fermî di Sûriyê de, hem jî em ber bi guhertinekê ve biçin da ku zimanê Kurdî di warê rojnamevaniyê de li hemû kenal û dezgehên fermî de were bikaranîn. Qada şîrovekirina maçan bi zimanê Kurdî gelekî girîng e, rast e mijarkeke zehmet e ji bo Kurdî, lê em dizanin ku zimanê Kurdî zimanekî zengîn e. Em dizanin ku maç li Rojava bêyî şîrovekirinê tên lidarxistin. Ji ber zengînbûna zimanê Kurdî jî divê aliyên peywendîdar li Rojavayê Kurdistanê guh bidin şîrovekirina bi Kurdî. Xebata şîrovekirina bi zimanê Kurdî xwedî girîngiyeke mezin e û siberoja wê ji bo Kurdan gelekî girîng e. Ji ber vê girîngbûnê jî divê were lipêxşistin, pêşxistina şîrovekirina asta şîrovekirina werzîşê jî erkê hemû rojnamevan, kenal, ajans, saziyên werzîşê û dezgehên rojnamegeriyê ye."

**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



## Şerê taybet dibe sedema kûrkirina kirîzê



Berpirsê Navenda Kurdî ya Lêkolînan li bajarê Bochum yê Almaniyayê Newaf Xelîl diyar kir ku Şerê Taybet ê ku bi rêya dezgehên ragihandina Şamê tê meşandin ji şerê çekdarî ne qut e û got: "Şerê taybet beşek ji şerê çekdarî ye, pêwîst e mirov dezgehên ragihandinê yên ku cihê baweriyê ne, bişopîne."**R-5**

## Li cîhanê kuştin û revandina jinan bûye terzê zihniyeta desthilatdar




Çîna serdest a zayendperest kuştina jinan wek bûyerek ji rêzê temaşe dike, mafê jiyanê û nasnameya jinan bin pê dike. Diyardeya tundiyê xwe digihîne 5 hezar sal berê ku her 11 deqeyan jinek di cîhanê de bi rê û rêbazên cuda tê kuştin.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1296 | 6-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# SIYAMEND ELÎ: ÇEKA QSD'Ê HEBÛN Û PARASTINA GELÊN SÛRIYÊ YE

Berpirsê Navenda Ragihandin û Pêwediyan a YPG'ê Siyamend Elî diyar kir ku balkişandina hikumeta veguhêz a Şamê tenê li ser hêza leşkerî ya QSD'ê rast nîne. Ji ber ku li herêmên dagirkirî hîn kiryarên dijmirovî têne meşandin, hem jî xeteriya DAIŞ'ê berdewam e û QSD'ê bi dehê salan e gelên Sûriyê diparêze, lewma çeka QSD'ê hebûn û parastina gelên Sûriyê ye.**R-4**






## Cîger Efrîn: Di 30 salên li zindanê de min tu zagonên mafê girtiyan nedît

Yek ji girtiyên Tevgera Azadiyê di zindanên dagirkeriyê li Bakurê Kurdistanê de ku 30 sal û 13 rojan tê de qedandine, Cîger Efrîn da zanîn ku di girtîgehên dagirkeriyê de tu rêgezên hiquqî nîn in û got: "Guhertina rewşa girtiyên di zindanên dagirkeriyê de, bi guhertina mercên li ser Rêber Apo ve girêdayî ye".**R-3**



## Zehmetî tu carî rê li pêşiya berxwedaniya gelê Efrînê nagire

Rêveberê Komîteya Koçberên Efrîn û Şehbayê ya Qamişlo Mistefa Hesen diyar kir ku gelê Efrînê du caran bi darê zorê rastî êşa koçberiyê hatine û wiha got: "Ji ber rewşa jiyanê di kamp û dibistan de gelê Efrînê bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin."**R-6**

**Gelo hikumeta Şamê yan Tirkiyê dê li ser masa Parîsê be?**
Zekî Bedran R-5

## Ji çiraxên hunera Kurdî



Hunermend Nizar Yûsif stûneke hunerî ya berze û bejneke wêjeyî ya bilind. Di dîroka gelên ku hatine piştguhkirin û ji nasnameya xwe hatine dûrxistin, huner ne wekî xoşîbirek bedewî diyar dike, lê ew mîna amûrek berxwedanê û kiryarek mayînde derdikeve holê.**R-7**

# Li cîhanê kuştin û revandina jinan bûye terzê zihniyeta desthilatdar

Çîna serdest a zayendperest kuştina jinan wek bûyerek ji rêzê temaşe dike, mafê jiyanê û nasnameya jinan bin pê dike. Diyardeya tundiyê xwe digihîne 5 hezar sal berê ku her 11 deqeyan jinek di cîhanê de bi rê û rêbazên cuda tê kuştin.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Li cîhanê kuştina jinan bûye rojev, her roj li tevahî welatên cîhanê jin tên kuştin, revandin, tecewîz û tundî ji aliyê hevjîn, malbet, mêrên zayendperest û li herêmê dagirkirî ji aliyê DAIŞ'ê ve, tê kirin. Mêr kuştina jinan weke mafeke rewa dibîne, her roj destdirêjî û tecewîz li ser jinê tê kir ew mêrê ku bi zihniyeta baviksalarî, tundperest û koleperest tevdigere qetilkirin jinê hêsan dibîn e. Li Bakur, Başur, Rojava û Rojhilatê Kurdistanê jin rastî tund û bêmafiyê tên, sala 2025'an bûye sala kuştin û revandina jinan.

Qetilkirina jinan di van demê dawî de zêde bûye, ji ber ku bandora hişmendiya desthilatdariyê, zayendperestî, baviksalariyê û tundiyê gelek li ser mêr kiriye, mêrê ku rojane kuştinê li ser jinê dike nikare xwe ji zihniyeta tundî û kuştinê biparêz e. Ew mêrên ku koletiyê li ser jinê dikin û dibêjin jin koleye, eger jin carekê koleye mêr deh caran koleye, koletiyê ji dewlet, desthilatdariyê û zayendperestiyê re dike, nikare xwe ji bin bandora dewletê rizgar bike wê çawa azadiya jinê qebûl bike?

Di vê mijarê de em ê kuştina jina di çarçoveya xaka Kurdistanê û desthilatdariya ku ji aliyê wan dewletan vet ê meşandin, bigrin dest. Kuştin û revandina jinan li Tirkiyê, herêmên Başûrê Kurdistanê, Îran, Sûriyê, herwiha li herêmên ku di bin desthilatdariya HTŞ'ê de ne û tevahî cîhanê, pir zêde bûne.

### 'Li Sûriyê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê jin bi awayekî hovane tê kuştin û revandin'

Sûriyê zêdetirî 60'î salî di bin serwerî, desthilatdarî û qirkirina Rêjîma Baas de ma, ev 60 sal bi binpêkirin, qetilkirin, revandin û xistina jinan di nava zindanê de tijî bû. piştre di 8'ê Kanûna 2024'an de desthilatdariya Baas hate ruxandin, Sûriyê kete nava destê Desthilatdarekî nû ya HTŞ'ê, bi ruxandina Rêjîmê re û hetina HTŞ'ê re gelê Sûriyê bi hêviyek mezin bûn ku rewşa Sûriyê ji berê baştir bibe, lê belê rewşa Sûriyê bi hatina HTŞ'ê re aloztir bû kuştin zêde bû û bi taybet di milê jin de, rojane li herêmên di bin serweriya hikumeta veguhêz a Şemê de jin tên kuştin û revandin.

Li herêmên di bin serweriya hikumeta veguhêz a Şamê de zêdeyî 630'î jin hatin kuştin û 400 jin jî winda ne ku heya niha çarenûsa wan ne diyare. Li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî (NY) ku ji Adara 2025'an û vir ve li Lazkiye, Tartûs, Hama, Hûms, Şam û Helebê 80 jin û zarokên keç ên Elewî hatin revandin û dîmenên wan hatin weşandin. Pispor van bûyeran weke parçeyek ji tundiya berfireh a li Sûriyeyê ya li hemberî jin dibînin. Jin û zarokên keç ên ji 3 heta 40 salî, bi giranî di nava rojê de dema diçûn dibistanê, serdana xizmên xwe, yan jî ji bo demeke kurt ji malê derketin hatin revandin. Hate ragihandin ku piştî bûyerê bi giranî gef li malbatên wan hate xwarin ku ji raya giştî re neaxivin û destpêkirina lêpirsîna fermî hate astengkirin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî, ji destpêka sala 2025'an de 17 jin rastî tundî hatin, 15 jin hatin kuştin, 3 jin rastî rawekirina kuştinê hatin, 11 jinan xwekuştin, 2 jin rastî tecewîzê hatin, jinek rastî gef hat, 3 şantaca elektironî, 25 jin hatin revandin , 2 jin hatin şewtandin û 7 bûyerên pir jinî, hatin rûdan. Her cendî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev bûyer bêne qewimandin jî, lê li gor Sûriyê û welatên din yên cîhanê di asteke kêm de ye. Di aliyê din de jî ger di welatekî de şoreşeke bi heybet a ji bo bidestxistina mafê jinê û bidawîkirina tundiya li ser civak û jinê bi taybet her wiha ji bo guhartina zihniyet, 13 sal têkoşîn tê kirin, bê guman di nava hebûna tevgerên jin, sazî û destgehên jin rûdana van bûyeran mijara rexenekirin û rexne dayînê ye.

### Tevizandin, êrişa fîzîkî û zewicandina bi darê zorê

Pisporên Neteweyên Yekbûyî diyar kirin ku li gorî agahiyên gihîştin ber destê wan hin ji mexdûran di dema dîlgirtinê de hatin tevizandin û êrişên fîzîkî li wan hate kirin. Her wiha di raporê de hate gotin, zarokên keç bi zorê hatin zewicandin. Pispor dibêjin, ev rewş nîşan dide ku li hemberî jinên Elewî kampanyayeke bi rêk û pêk a li ser zayendîperestiyê tê meşandin. Piştî ku 13'ê Tîrmehê êrişên li dijî Siwêdayê destpêkirin, li vî bajarî jî hovîtiya li dijî welatiyan, komkujî û revandin gihiştin asta herî jor. Li gorî rapora çavdêriyê ya herî dawî hejmara kuştiyên li Siwêdayê derket zêdetirî hezar kesî ne. HTŞ'ê li Siwêdayê bi awayekî hovane jinan dikujin û komkujiyan li ser wan dikin herwiha bi zihniyeta DAIŞ'ê jinan dikujin û direvînin heya niha zêdetirî 79 jin hatine revandin.

### Dewleta Tirk rê li ber tundiya li ser jinan vedike

Polîtîkayên bêcezahiştinê, parastina tundiya di nav malbatê de û kêmasiya parastina jinan a ji tundiya mêran ku divê ji aliyê dewletê ve pêk were, rê li ber tundiya li ser jinan vedike. Herwiha betalkirin an jî neqebûlkirina peymanên wek Peymana Stenbolê jî yek ji xala ku cesaretê dide kujeran e. Li Tirkiyeyê sala 2025'an qaşo wek sala malbatê hatibû îlankirin lê ji zêdetirî 150'î jinên ku di nav van 7 mehan de hatin kuştin, piraniya wan di nav malbatên xwe de hatine kuştin. Dîsa bi dehan jinên ku dawî li jiyana xwe anîne ji ber pirsgirêkên di nav malbatê de neçarê vê rêbazê hatine hiştin û dawî li jiyana xwe anîne. Ji ber ku di bin bandora kesên derdora xwe de mane mirov nikare van mirinan wek xwekuştin jî pênase bike. Kuştina jinan a di 2025'an de xetereya li ser jiyana jinan radixe ber çavan.

### Li Başûr Kurdistanê daneyên kuştina jinan her diçe zêdetir dibin

Ji sedemên bêparhiştina rola jinê û guhartinan. Mizgeft û mele, medya, fahîşe, fûhûş, partî û rêxistinên siyasî yên ji aliyê kapîtalîzma global û Îslama siyasî ve hatine afirandin, klûbên şevê û fûhûşê yên li ser navê azadiyê, eşîran, malbatan û çandên baviksalarî hene. Şiddeta li hemberî jinê roj bi roj zêde dibe. Kuştina bi zanebûn di bin navê namûsê de bûye diyardeyeke eşkere di civakê de ku tenê jin dibin qurbanî. Xwekuştin bi rêya xweşewitandin û narsîsîzmê asta rewşê derbas kiriye û roj bi roj bûye diyarde û zêde dibe. Hesabpirsîn û qanûn bi roleke girîng ranebûye û bi peymanên eşîrî û malbatî tê nixumandin. Destdirêjiya li ser jinan hê jî heye û tu qanûn tune ne ku vê diyardeyê ji holê rakin û heta jinên ku di sektora taybet û şîrketan de kar dikin kêm caran dikarin parastina xwe bikin û di bin navê derfetên kar ên guncaw de tên tacîzkirin.




Diyardeya xwekuştinê jî li Başûr gelekî belav e. Sedemên wê gelek in; malbat zarokan neçar kirine gelek tiştan dikin ku nikarin fêm bikin, ji xwendinê bê par dihêlin, nahêlin bi tenê ji malê derkevin. Ev kiryar ji xwezaya jinan a azadîxwaz dûr in û di encamê de jin bi rêbazên şaş hewl didin azadiya xwe bi dest bixin ku di dawiyê de xwe dikujin. Belavbûna teknolojiyê û înternetê, hejmara sûcên kuştina jinan û tundiyê zêde kir. Bi taybet bûyerên şantajê ku li dijî jinan pêk tên, bi taybet zarokan.

Daneyên kuştina jinan her diçe zêdetir dibin. Ji destpêka sala 2025'an ve heta niha , li Başûrê Kurdistanê 27 jin hatin kuştin û 5 jinên din jî bi awayekî bi guman jiyana xwe ji dest dan. Li Herêmên Başûrê Kurdistanê nalîze û qanên li ser jin ji Îslamê tên wergirtin û Îslam gelek diyardeyên ku li vî welatî rû didin rewa dike û rêxistinên jinan tenê bi partiyên baviksalariyê ve girêdayî ne û heta niha nekarîne ti ji van diyardeyan ji holê rakin ji ber ku di rastiyê de pêkanînerên sîstema baviksalariyê ne. Hêviya me ew e ku jin bêhtir ji bo mafên xwe têbikoşin.

### Li Îranê rêjeya kuştina jinan her roj zêde dibe

Li Îranê di navbera 21'ê Nîsan-21'ê Gulanê de 31 jin û 2 zarok hatin kuştin, 6 jin hatin bidarvekirin, 10 jin û 3 zarok bi awayê koman jiyana xwe ji dest dan.

Li Îranê şiddet û bûyerên kuştina jinan her zêde dibin. Kujerên jinan zêdetir mêrên bi wan re zewicandî, bav, kur an jî bira ne. Meşrûkirina şiddeta bi olê dibe sedem ku ev sûc bê ceza bimînin. Di zagonên Îranê de, bendên ku pêşî li şiddeta li ser jinan bigrin tune ne, ji ber hukmên olî yên li gorî şîroveyên desthilatdariya mêr, dibin sedema kêmkirina ceza yan jî bêcezabûnê. komkujiyên li ser jin û zarokan, darvekirin û mirinên gumanbar ên meha nîsanê ango dîroka di navbera 21'ê Nîsanê û 21'ê Gulan 2025'an de hatine tomar kirin, 31 jin û 2 zarok hatine kuştin, 10 jin û 2 zarokan bi guman de jiyana xwe ji dest dane û 6 jin jî hatine darve kirin.

Li Îranê rewşa jinan ji her demê zêdetir dijwartir bû, Jin êdî li tu derê xwe di nav ewlehiyê de nabînin ji kuştinên navmalbatî û tundiya civakî, pergala darazê jî cezayên darvekirin û girtîgehê li jinan dibire. Her meh li Îran û Rojhilatê Kurdistanê cînayetên jinan ku hatina belgekirin. Li gor raporê di Çile û Sibata 2025'an de 19 jin û 9 zarok hatine kuştin. Her wiha 3 jinên ku berê ji ber kuştina mêrê xwe cezayê darvekirinê li wan hatiye birîn jî, li girtîgehên cuda hatin înfazkirin.

Rêxistina Mafên Mirovan ya Herana ragihand ku li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê di nava 4 mehan de 45 jin hatine kuştin.

Heman çavkaniyê ragihand ku di meha Adarê de 17 jin, Nîsanê 19 jin, Gulan 6 jin û di Hezîranê de jî 3 jin hatine kuştin.

Di raporê de behsa sedema kuştinan jî hate kirin û hate gotin: "Ev kuştin ji ber sedemên cuda yên malbat û hêcetên din pêk hatine. Bi piraniya kuştinan bi rêbazên cuda ango amûrên cuda pêk hatine."

Hêjayî gotinê ye sala borî li Rojhilatê Kurdistan û Îranê 158 jin hatibûn kuştin



# Ji çiraxên hunera kurdî



**Can Yûsif**

Hunermend Nizar Yûsif stûneke hunerî ya berze û bejneke wêjeyî ya bilind. Di dîroka gelên ku hatine piştguhkirin û ji nasnameya xwe hatine dûrxistin, huner ne wekî xoşîbirek bedewî diyar dike,lê ew mîna amûrek berxwedanê û kiryarek mayînde derdikeve holê, dibe ku miletê kurd bi hemû derd û birînên xwe yên ku di dirêjahiya dîrokê de dîtîn û dûrbûna ji hebûna xwe di stranbêjiyê de dibîne ku ew amûreke ji bo tekezkirina hebûna wî û di dengê stranbêj de, peyamên xwe vedişêre û xemên xwe vedibêje. Hunermendên Kurd di parastina nasnameya çandî, berevaniya ziman û belgekirin bîrdanka giştî ya gelê ku ji dîroka xwe ya fermî hatî vedizîn, rolek girîng lîstin, lê gelê kurd dîroka xwe di stran, awaz û di wijdana gund û bajêr de afirand. Hunermend û awazdêner Nizar yek ji dengên hunerî yê ku ruhê welatparêziya Kurdî pêkanîye û roleke girîng di parastina mîrateya çandî, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî de lehîstiye.Hunermend, bestekar û helbestvanê Kurd Nizar Yûsif ji dê û bavek Kurd (Yûsif û Mirarî) di sala 1960'an li gundê "Beroj" ku dikeve li pesara Ciyayê Qereçox li gundewarê Dêrik hatiye dunya yê û ew di himbêza malbatek neteweyî ya Kurd de, ku bi dîroka xwe ya tekoşîna kevnare û girêdana xwe bi nirxên rûmet û azadiyê ve tê naskirin mezin bûye , evê jîngehê bandorek kûr li ser avakirina kesayetiya wî û hişmendiya wî ya hunerî û neteweyî kir. Ew li herêma Korçeran mezin bû, ya ku mîna mîrateya Kurdî ya resen tê naskirin û bûye çavkaniya şoreşger û azadîxwazan û dergûşek ji bo hunermend û stranbêjên ku peywirê parastina çand û nasnameya xwe dikin. Di navbera geliyên Koçeran û quntarên çiyayê Qereçoxê, Nizar giyan û hinêra xwe pêşxist di jîngehek ku bûye dayîna sembolên hunera kurdî yên mîna (Mihemed Teyîb Tahir, Silo koro,Yûsif Misêlîx, Mela Xelîl û hin din) yên ku asîmanê hunera kurdî ronîkirîn, wî zaroktiya xwe di himbêza mezinan, û serwerên êl û eşîrên Kurd û Ereban, û kesayetên civakî yên navdar ên li herêmê bûrand, ew tim hevrêyê bavê xwe Hac Yûsif bû ku bişarezayî û nêrînên xwe yên durist dihate zanîn û mîna şêwirmendê Nayîf Paşa cih digirt, li koçka wî , ya ku bibû dîdargeha rihspiyan û serokên eşîran û kesayetên civakî, rewşenbîr û hunermendan û qada şêwermendî û nêrînê, li wir Nizar guhdarî çîrokên qehremaniyê û çîvanokên welat, helbestên stranbêjiyê û bûyerên neteweyî dikir, ew jîngeha dewlemend çavkaniyek bû ji bo Nizar, wî nirxên rûmetê û zanistên huner û stranbêjiyê ji kaniyên wê yên zelal vexwartin.

Nizar ji destpêka hestiyariya xwe ya hunerê, ji hêmanên xwezaya li hawîrdorê xwe wergirt, ji teqteqa dengê aşê kevnar, ji pistîna bayê çiyayê Qereçoxê, ji stranên şivan û bêrîvanan û sîrûdên xwişxwişa daran "kurkê Rewal û Keçika Kezî", wî awazên xwe yên pêşîn vehûnandin û helbestên xwe yên despêkê sazkirin ku bûn semfoniya jiyana wî ya yekem û karî pê hevrêziyê di navbera helbest û muzîkê de çê bike.

Wî qonaxa seretayî li gundê xwe, Beroj û ya amadekarî li bajarê Dêrik û ya navîn li bajarên Hesekê û Şamê xwend, piştre, wî dev ji xwendinê berda û tevlî nav refên tevgera kurdî bû û dest bi çalakiyên xebatê kir di nav girseyên gel û xwendekarên Şamê de, ew di sala 1990 de zewicî û bavê sê zarokay e (kurek û du keç).

Meylên wî yên hunerî, evîna wî ji bo şêwekarî û stranbêjiyê, eşqa wî ya kûr ji bo muzîkê di temenek biçûk de destpêkir, hîn di deh saliya zaroktiya xwe de taybetmendiyên hinêra wî derketibûn holê .Ew di qonaxa amedekariyê de abeşdarî gelek pêşangehên dibistanê bû û herkesê li dora xwe matmayî dihişt, bi şiyana xwe ya şêwekarî û jêhatîbûna xwe ya derbirîna ji bo rengan û dengê wî ne kêmitirî pirtika wî diyar bû, ew xwedan gewriyek zelal û dengek nazik bû ku xwe berdida di her dilan de ,ew bi stranên neteweyî û folklora Kurdî bi bandor bû û giyanê xwe yê hunerî ji sembolên hunera kurdî wergirt, yên mîna (Mihemed Şêxo, TehsînTaha û Aram Tîgran) da ku gavên xwe yên pêşîn di rêça hunerê de bavêje. Di dawiya salên heftêyan de, li ser bingeha mîrasa Koçeran ya dewlemend di stranên gelêrî û destanên stranbêjiyê de, Nizar dest bi gavên xwe yên hunerî ên yekem kir û dest bi jenandina Tembûrê kir. Di destpêka salên heştiyan de, Nizar wekî awazdêner û nivîskarê stranên xwe yên taybet dihate nasîn ku awazên wê ji tonên xwezayê û ji meqamên kurdî yên kevneşop dihatin verêstin, wî giyanek nû daxiste stranbêjiya Kurdî, bêyî ku ji reseniya wê veqetîne, di nav stranên wî yên herî navdar ên bi dengê wî dengdane, ji gotin û awazên wî :

1- Dîlberê
2-Efrîn
3-Newroz
4-Gulîzer

wî di salên (1984 heya1990) çar albumên stranên ji gotin û awazên xwe belavkirin, ew beşdarî damezrandina gelek komên hunerî yên Kurdî li Şam, Homis, Hesekê û devera Koçera bûye, ku ev kom çiraxên biçûkbûn, rêçikên bîranîn û nasnameyê ronî dikirin di dema ku gotin dihate dorpêçkirin û nasnameya kurdî di bin sîberên nebûnê de dihate veşartin,dema ku rejîma Sûrî li pey hemwelatiyan û hunermendan diket û tavêjtin di reştariya girtîgehan de , li gel wan bahozan, Nizar amade bû bi helbest, deng û awazên xwe li gelek helkeftên neteweyî, festîvalên hunerî û cejnên Newrozan, ji beşdarîyên wî herî berbiçav:

1-Cejna karkeran li Qamişlo- Terteb sala 1982'an û li Indîwerê sala1985.
2-Cejnên Newrozan li Seydnaya sala 1985'an û li Libnanê di salên 1986 -1987 - 1988 (Bir Elyas, Encûr , Şitora )û di salên 1988-1989 de li Besta Sûs - Koçera.

Di sala 1991'an de, ew tevlî koma Cûdî bû, ku dihate nasîn bi rola xwe ya pêşeng di vejînkirina konsertan û helkeftên neteweyî nemaze ahengên cejnên Newrozan, ji stranên wî yên navdar ku koma Cûdî gotine :

1-Paleye wer bi girin
2- Bûka cîhanê
3-Girop girop vaye tên.

Şûntilên wî bi tenê li ser koma Cûdî sînordar nema, lê awazên wî yên şoreşgerî û peyvên wî yên germahî, gelek komên hunerî yên Kurd û hunermendên Kurd gotine.

Ji stranên wî yên herî navdar ku koma Berxwedan û hunermendên Kurd gotine:

1- Warê Me Cenge (Xelîl Xemgîn û şehîd Mizgîn)
2-Partîzanê Me Çûn Bakur (Peywan)
3-Hoy Hoy Apê Me (Peywan)
4-Bûka Cîhanê (Eylem)
5- Hevalên Qahreman (Hozan Çiya)
6- Hoy Duniya yê, - Dengê Diyarbekir im- Ala Rengîn (Hozan Comerd)
7-Gundê Me Dîlane (Hozan Kanî Nar)
8-Zozan- Qêrîn (Hunermend Ferhan Şero )
9- Rengê Jînê - Hey lo Bejna Wê (Farhan Gurî)

Di sala 1996'an de, hunermend Nizar tevî malbata xwe ji Rojava derket û berê xwe da jiyana xerîbiyê û li Elmaniya rûnişt , li pişt xwe xaka zaroktiya xwe, bîranîna gundan hişt û vê yekê, di dilê wî de xeme û kuleke kûr çêkir, jiyana xurbetê nakarî wî dûr bike ji evîna wî ya ji bo huner, gotin, stran û muzîka kurdî ,sirgûn jêre bû ardûyek din ku pê agirê israrbûnê gur bike ku bihêle ew rêya xwe bidomîne û pîşeya xwe ya hunerî û torevanî pêş bixe .Ji sala 2000 heya 2017'an, ew li Ewropa beşdarî gelek pîrozbahiyên neteweyî, festîvalên hunerî û kongireyên wêjeyî bûye .

Ji çiyayên bilind ên Qereçoxê, ji çavkaniyên xweşav ên Koçera, ji ritma dahol û pistîna tembûrê , ji axîn û xemgînîya dûrketinê û hêvîya vegerê bo welat, Nizar stranên xwe vehûnandin wek belgeyên zindî ku dibe çîroka miletekî kevnar û birîndar, lê her tim bi rûmeta xwe dijî.Wî gelek helbestên kevneşopî ên stranbêjiyê li ser bingeha kêş û rêzikan nivîsandine, ji ber vê yekê gelek hunermendên kurd, ji wan re awaz çêkirine û gotine, ji nav wan hunermend Nûhad Diyab, ku gelek helbestên wî çêkirine û gotine mîna :

1- Çavên te yên reş
2-Xanim
3-Ji dûrbûna te
4-Yar

Nizar di stran û gotinên xwe de rehjena rast a nasnameya kurdî pêkanî ye, dengê wî bûye çiraxek ku rêyên berxwedana çandî ronî dike û tarîya jêbirin û piştguhkirinê tarûmar dike, bi têkilkirina wî di navbera kevn û nûjen, tembûr û sîrûdên gundan, peyvên bi axê re sitrayîn û helbestên bi bîna welatê xwe tije bûyî , Nizar pir avakirin ku dema borî bi ya îroyîn ve girêdide û deriyên kelepûrê vedike bo pêşerojê.

Di sala 2005 de, wî albûmeke bi navê "Kevokên Deştê" weşand, ku têde12 stranên ji gotin û awazên wî hebûn, di van stranan de, ewî tevlîhevîya hestên neteweyî û wejdanî pêkanî ye, wî awazên xwe ji bîna çanda kurdî û rehjena axê wergirt, Karê wî tenê bi weşandina alboman ne qediya ,wisa jî zêdetir ji 10 klîbên muzîkî pêşkêşkir, tev ji gotin û awazên wî, ku ji ruhê şoreşgerî û evînê tije bûn, ji klîbên wî yên navdar:

1-Efrîn
2-Dinyayê
3-Ala Rengîn
4-Bîranîn
5-Kinê
6-Dilo

Hinêra wî ya hunerî û wêjeyî tenê bi stranbêjiyî, melodvanî û nivîsandina helbestên stranbêjiyê sînordar nema, lê di warên din ên afirîneriyê de jî diyar kir, ku wî gotar û lêkolînên çandî, digel helbestên xwe yên pirreng, ku di navbera helbesta klasîk ya terazû, helbesta nûjen û ya azad de, nivîsandiye, ev berhemên wî hatine weşandin di gelek kovar, rojname û malperên kurdî de, mîna:(Kovara Avaşîn, Dîwar, Pênûsa nû, kovara Hewar, Gemiya kurda, Sema kurdî û hwd),da ku bibin şahidê kûrahiya çanda wî û pênûsa wî.

Herwiha ew ji dîmena medyayî ne dûr bû; gelek kanalên televizîyonê bi wî re hevdîtin û diyalogên hunerî û wêjeyî çêkirin,wekî ( Med TV, Kurdistan TV, Rudaw , Waar TV, Rewşen TV, Peyv TV), di heman demê de, wî rolek girîng lîst jî wekî pêşkêşkerê bernameya "Vedenga Awazan" li ser ekrana Peyv TV, ku di nav de wî hejmarek hunermendên kurd ên ji derveyî welat kirin mêvanê bernameya xwe, ku dengê wî û dengê bernameya wî, bibû wekî pirekî di navbera afrîneran û pirsgirêkên gelê wan de.

Ji nav berhemên wî yên edebî yên çapkirî, pênc dîwanên helbest û pirtûkek lêkolînî weşandine , tev bi zimanê kurdî ne, ev berhem jî bûn şahidê evîna wî ya kûr ji bo peyv û awazê û dilbêjiya wî ji bo parastina nasnameya çandî ya gelê wî:

1-Rêwiyê Xewna Avsonî" (Dîwana yekem), Almanya, 2008
2-Kedera Min ( Dîwana duyem) Hewlêr- 2016
3-Kêferata Paytexta Kor (Dîwana sêyem), Hewlêr, 2016
4- Bêdengiya Şevê ( Dîwana çaremîn) Almanya - 2019
5-Hêlîna Xewnan (Dîwana pêncemîn ), Almanya, 2021
6-Zagros Zingilê Şaristaniyê ,lêkolînek li ser muzîkê û afirîneriyê), Dohuk, 2025

Ji berhemên wî yên edebî yên li ber çapê :

1- Pirtûkek lêkolînê li ser muzîk û dîrokê
2- Du Dîwanên helbestan bi zimanê Kurdî.
3-Dîwanek ji helbestên wî yên bûne stran, her wekî din bi dehan gotarên edebî û çandî bi zimanê kurdî.

Belê Nizar helbestvan e, herwiha awazdêner û stranbêj e, wî gotinên xwe bi zimanek zelal, rasterast, lê bi kûrahî nivîsandine, di nav de, vedenga zeviyan, çiya û dolan tê bihîstin û ew hêviya azadî û aşitî ya mirovê kurd nîşan didin.

Bi vî rengî , Nizar Hacî Yûsif dê herdem bimîne wekî yek ji nimûneyên navdar ên huner û wêjeya neteweyî ya kurdî, ku tînê bîra me, ku stran dikare bibe mala nasnameyê, penaya giyan û helbest bibe Keleha azadî û derman ji bo birînan, li seranserê kariyera xwe ya hunerî, Nizar ji peyama xwe ya hunerî û welatparêziyê re dilsoz ma, girêdayî reseniya hunera kurdî ya rastîn ma, bû parêzvanê ziman, nasname û kelepûra gelê xwe li dijî hemû hewldanên helandin û piştguhkirin,heya îro jî, Nizar berdewam e bi dayîn û xebatê xwe; helbestên xwe bi şîrînîyeke taybet dinivîse ku gotin li ber serî diçimînin û awazên xweş diafirîne ku can û giyanê mirovan pê şa dibin, melodiyên bedew bihestekî bilind diafirîne ku xwe berdidin nav dilan û hest û giyanan dilivînin, deng û stranên wî dibin şahidên zindî yên nasnameyekî qet namire û mîrateyek çandî ya zindî dimîne. Tenduristiyek domdar û dayîn û afrînerîyek zêdetir jêre dixwazim.

# Zehmetî tu carî rê li pêşiya berxwedaniya gelê Efrînê nagire

Rêveberê Komîteya Koçberên Efrîn û Şehbayê ya Qamişlo Mistefa Hesen diyar kir ku gelê Efrînê du caran bi darê zorê rastî êşa koçberiyê hatine û wiha got: "Ji ber rewşa jiyanê di kamp û dibistan de gelê Efrînê bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin."

**Aryen Hesen/Qamişlo**

Gelê Efrînê du caran rastî êşa koçberiya bi dare zorê hatine. Di 18'ê Adara 2018'an de ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê yê li ser herêma Efrînê gel neçar dimîne ku koçber bibe, piştî koçberiya ji Efrînê gel berê xwe didin Şehba û Til Rifetê 7 salan jiyana xwe bi berxwedaniyî û hêviya vegerê li ser axa xwe berdewam dikin, lê mixabin ji ber êrîşên dewlata Tirk û çeteyên wê ve ya li ser herêma Şehbayê di 2 Mijdara 2024'an de gelê Efrînê carek din koçber dibin û piştre berê xwe didin kantona Cizîrê, Firatê û li wir bi cih dibin. Gelê Efrînê piştê ewqas êş, berxwedanî û koçberî li benda vegerek bi ewle û rêxistinin.



Di vê çarçoveyê de Rêveberê Komîteya Koçberên Efrîn û Şehba ya Kantona Qamişlo Mistefa Hesen ji rojnameya me re axivî.

**'58 roj ji berxwedaniya Serdemê'**

Mistefa Hesen destnîşan kir ku çîroka gelê Efrînê bi êş û berxwedaniyê dijî ye û wiha got: "Di 20'ê Çileya 2018'an de ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve êrîş li ser herêma Efrînê pêk hat herwiha 72 balafirên dewlata Tirk a dagirker rabûn ser herêma Efrînê. Gelek navçe û gundên Efrînê hatin bombebarankirin, lê ema tu carî hêvî û berxwedaniya gelê Efrînê têk neçû, lê belê gelê Efrînê bû sembola hêz û berxwedaniyê, li hemberî êrîşa dewleta Tirk û çeteyên wê ve 58 rojan li berxwedan û bûn bersîv ji dijmin re, lê ji ber ku êrîşa dewleta Tirk li ser herêmê zêde bûn û rewşa aramiya gel kete bin gefê, gelê Efrînê naçar dimîne ku bi dare zorê koçber bibe û berê xwe bidin herêma Şehbayê û li wir bi cih bibin."

**'Piştî 7 salan ji berxwedanî û êşê li Şehbayê carek din rastî koçberiyê hatin'**

Hesen dazanîn ku piştî berxwedaniya 7 salan carek din em koçber bûn û wiha domand: "Piştî ku em ji Efrînê koçber bûn û me berê xwe da herêma Şehbayê da ku em li wir bi cih bibin û jiyana xwe berdewam bikin, lê em a jiyana li şehba gelek zehmet bû ji ber ku ew di nava dorpêçê de bû, rojane dihat bombebarankirin û ji ber êrîşên rojane yê ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve li ser Şehbayê, gelek kesan jiyana xwe ji destdan herwiha zarok jî nava wan de hebûn. Lê ema gelê Efrînê rixmî wê berxwedanî dikir û hertim li hêviya vegerê bûn, gelê Efrînê li gorî ku êrîş li ser Şehbayê pir bûn lê digotin em ji vê derê naçin ji ber ku ji Efrînê ve nêze, bêhna Efrînê û zeytûnên Efrînê tê me. Lê ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê yê li ser herêma Şehba û Til Rifetê zêdebûn piştî 7 salan ji berxwedaniyê di 2 Mijdara 2024'an de gelê Efrînê carek din êşa koçberiyê dibînin û dîsa bi darê zorê koçber dibin û berê xwe didin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da ku li wir bi cih bibin û di bin sîwana Rêveberiya xweser de bimînin."

**'Her roj zehmetî para koçbera ye'**

Mistefa diyar kir ku jiyana koçberan bi zor û zehmetiyan tijî ye û wiha got: " Koçberên di kampa û dibistana de jiyan dikin her roj zehmetî û êşan para wane, ji ber rewşa germahiyê, kêmbûna avê û elektirîkê rastî gelek zehmetiyan û nexwaşiyan tên. Herwiha zarokên Efrînê ji ber sedema koçbrerî û şer ji xwandina xwe dorketine, ji ber êrîşan û şer bandoreke mezin li ser deroniya van zarokan hat kir, bû sedem ku zarok ji dibistan û hestên zaroketiyê xwe dûrkevin.



Ev zarok bûn qurbaniya van şeran û êrîşan. Li gorî hemû êş û zehmetiyan gelê Efrînê têkoşîn dike û her roj li hêviya vegerê ne, tu carî hêz û îradeya vê gelî nakevê û wê hertim berxwedanî, têkoşîn bikin heya ku vedigerin ser ax û warê xwe."

**'Vegera Efrînê hêviya her Efrîniyekî ye'**

Rêveberê komîteya koçberên Efrîn û Şehba ya Kantona Qamişlo Mistefa Hesen axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Hêviya vegerê hertim di dilê gel de ye û em her roj têkoşîn dikin da ku vê rojê bibînin. Gelê Efrînê her roj li benda vegerê ne, lê em a vegerek bi ewle û rêxistinî be. Gelê Efrînê piştî ewqas koçberî û êş banga vegerê dikin lê ev veger di bin sîwana Rêveberiya xweser de be û bi awayekî rêxistinî û serbilindî be."

# 'Wê bi hevkariya welatiyan pirsgirêka çopê çareser bibe'

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Rêveberiya Beşa Paqijiyê ya Şaredariya Qamişlo Mihdî Eqîl destnîşan kir ku derfetên wan ên sînorkirî rê li ber karên wan a berhevkirina tevahî çopê digire û got, "Paqijiya bajêr ne tenê erkê şaredariyê ye, lê belê erkê hemû welatiyane û wê bi hevkariya welatiyan pirsgirêka çopê çareser bibe."**

Li gorî texmînan qaseya rojane ya çopê ya bajrarê Qamişlo di navbera 250 û 300 tonan de ye, di heman demê de şaredarî tenê 33 wesayîtên berhevkirina çopê hene, herwiha tenê 270 karkerên ku bajêr û deverên derdorê dişopînin hene. Ji ber ku tenê 33 wesayîtên berhevkirina çopê hene, ev yek jî rê li ber şiyana wê ya mijûlbûna bi vê mîqdara mezin digire, ku rojê derdora 20 ton çop li nikare were komkirin. Û bi germahiya havînê ya zêde re, çopa ku li kolanên bajêr belav bûne dibe çavkaniya bêhna nexweş û pirsgirêkek tenduristiyê ye.

Li bajarê Qamişlo rojane erebeyên paqijiyê û karkerên paqijiyê yên Şaredariya Gel ya Qamişlo ji serê sibeha zû ve li nava tax û kolanên bajêr digerin, da ku çopa ber deriyê malan û ya li kolanan kom bikin. Tevî ku erebe digere û li her taxê jî çopdank hene, dîsa jî piraniya welatiyan çopa xwe danaynin cihê wê yê guncaw û diavêjin devê deriyê malê. Ev jî dibe sedem ku çop li derdorê belav bibe û çareke din karkerên paqijiyê çopê kom bikin. Endamê Rêveberiya Beşa Paqijiyê ya Şaredariya Qamişlo Mihdî Eqîl têkildarî mijara paqijiyê ji Rojnemeya me re axivî.


**'Ekîbên şaredariyê heta niha tenê bi 33 wesayîtan û 270 endaman çopê kom dike'**

Rêveberiya Beşa Paqijiyê Şaredariya Qamişlo Mihdî Eqîl anî ziman ku karê beşa paqijiyê rojane ye û wiha got: "Em rojane derdikevin taxan paqij dikin, ekîba şaredariyê heta niha tenê bi 33 wesayîtan û 270 endaman vê çopê kom dike, di dema dawî de jî me 7 wesayîtên mezin yên nû anîn. Riyên sereke di rojê de sê caran tên paqijkirin û çopê kom dikin li sûka bajar, kolanên sereke yên wekî kolana Amûdê, Munîr Hebîb, rêya hawirdorê ya bajar, 9 nexweşxane, 13 tax û çend gundên li nêzî bajar kom bikin. Lê derfetên wan têrî nakin û rojê derdora 20 ton çop dimîne ku nikare were komkirin, ji ber çûnûhatina zêde li wan heye ev jî dihêlê ku çop lê zêde be, ji bo paqijiya taxan jî, hin tax her roj tên paqijkirin û yên din jî her roj tên paqijkirin ew jî ji ber çûnûhatinê ye weke bazaran, Haritey, Siyahî û hwd. Li taxan jî her 3 rojan carekê çop tê komkirin. Em hewil didin ku ev taxên ku gazinan dikin ji bo paqijiyê em wesayîtan teslîmî wan bikin di riya komînan de.

Rojên komkirinê çopa taxan jî hatine diyarkirin. Li gorî vê rojên hilanîna çopên taxan wiha ne:
Şemî: Taxên Hilêliyê, Wista û Siyahî
Duşem: Enteriyê, Cudî, Sînaa, Erbewiyê
Çarşem: Kornîş, Cirnik, Qudurbeg, Aşuriyê û Muwezefîn

**'Beşa paqijiyê hewil dide ku derfetên xwe zêdetir bike û rojane tevahiya bajar paqij bike'**

Mihdî Eqîl bal li ser astengiyên ku ew di karê xwe de dikşînin kişand û wiha got: "Gelek mirov bi me re ne alîkarin ku piştî ku em çopê kom dikin çopa xwe derdixînin kolanê, tevî ku seatên karê me diyarin û wesayîtên me bi giştî bi dengin, lê belê gel bi me re ne alîkarin ev jî dibe astengî li ber karê me û ew kesên ku li hawiya digerin û di çopê belav dikin ev jî astengiyeke li ber karê me. Ji bilî ku gel bi me re nabin alîkar wesayîtên me jî hindikin li gorî mezinbûna bajarê Qamişlo, lê tevî zehmetiyan dîsa karkerên me karê xwe rojane dikin û dîsa jî wesayîtên me rojane li nava taxên Qamişlo digerin û çopê kom dikin. Ku gel bi me re alîkarbin wê karê me baştir derbas bibe. Em weke beşê paqijiyiê yê Şaredariyê, li aliyekê jî hewl didin ku derfetên



xwe zêdetir bike û rojane tevahiya bajar paqij bike. 7 wesayîtên nû yên komkirina çopê me stendine û em ê 35 karkeran jî bigirin kar di demên nêz de."

Rêveberiya Beşa Paqijiya Şaredariyê Mihdî Eqîl di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Ez ji welatiyan dixwazim ku alîkariya me bikin, çopa xwe bê serûber neavêjin kolanan û di rojên komkirina çopê de bibin cihên komkirinê. Ji ber gelek mirov dibêjin ku wseayîtên me zêde bûne gereke ku pirsgirêka paqijiyê bê çareserkirin, lê belê ku gel bi me re ne alîkar be em çiqasî wesayîtan zêde bikin û têxin nava tevgerê de wê ew pirsgirêkên paqijiyê û çopê neyên çareserkirin."



# Cîger Efrîn: Di 30 salên li zindanê de min tu zagonên mafê girtiyan nedît

Yek ji girtiyên Tevgera Azadiyê di zindanên dagirkeriyê li Bakurê Kurdistanê de ku 30 sal û 13 rojan tê de qedandine, Cîger Efrîn da zanîn ku di girtîgehên dagirkeriyê de tu rêgezên hiquqî nîn in û got: "Guhertina rewşa girtiyên di zindanên dagirkeriyê de, bi guhertina mercên li ser Rêber Apo ve girêdayî ye".

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Girtîgehên dagirkeriyê; kabosên zindî ne. Li hember sîstema zext û îşkenceyê, Berxwedana Zîndanan ev zext têkbirin. Ger em bixwazin vê heqîqetê ji nêz ve nas bikin divê em berê xwe bidin kesên ku ev rastî rojane jiyan kirine ye. Cîger Efrîn ji Bajarê Efrînê ye ku ji ber têkoşîna di Tevgera Azadiya Kurdistan de hatibû girtin, 30'î sal û 13 roj di zîndanên dagirkeriyê de qedandin. Cîger bi vê diyalogê ji Rojnameya me re rewşa girtîgeh û girtiyan îfade dike.

**Hûn bûn şahidê sîstem û piratîkên zext û îşkenceyê a herî hov di hundir girtîgehên dagirkeriyê li Bakurê Kurdistanê de. Gelo hûn dikarin rewşa di wan zîndanan de tê jiyan kirin ji me re îfade bikin?**

Zîndan eynika dewleta ye, ger tu dixwazî welatekî nas bikî ka demokrasî, adelet û wekhevî heye an na, tu yê li zîndanên wan binêrî. Ji ber wê ger di zîndanê de mafê mirovan hebê, wê demê di wê civakê de hinek demokrasî jî heye. Di Tirkiyê de zîndan cihê îmhakirina îradeyê ye û cihê însanan bide poşman kirin. Di salên 80'î de bi heval Mazlûm, Kemal û Xeyriyan re xwestin teslîmiyetê feriz bikin, ew hevalên pêşengên me bi dirûşmeya "Teslîmiyet Îxanete û berxwedan jiyan e" ev polîtîkeya wan a zorê hat şikandin.

A din di hemû zîndanan de polîtîkeyên zext û îşkenceyê tê meşandin hin zîndanan fîzîkî ye di hinekan de jî pîskeolojîk e. Bi giranî piştî salên 90'î îşkenceyekê derûnê, pîskeolojîk dan meşandin. Ev çawa tê kirin? Keyîfî tê kirin, bi awayekî keyfî zextê li ser îradeya mirov dikin, miorv ji jiyanê bidin qutkirin, mirov di hundir de bidin poşmankirin. Her wiha zîndan ji zîndanê cuda ye, mînak zêndanên ku pir zêde şiddeta fîzîkî lê tên kirin hene, weke zîndana Alazixê, Erzrome..hwd. Û hin zêndan jî bi zextên pîskeolojîk şiddetê dikin. Di zîndanê de tenê tu û îradeya xwe ne, tenê îrade û baweriya te bi te re ye. Çeka te girêdanbûna te bi Rêbertiyê, bi gel, bi îradeya te û bi hevalên di zîndanê re ye. Di wir de bê mafî û bê edaletî di asta herî jor de ye, a din kes li derve zû zû nikare dengê te bibhîse. Yên Tevgera Azadiyê ji ber têkoşîna li derve û berxwedaniya Gerîla hin caran dengê me derdiket derve. Lê dîsa jî zexta ku li wir hebû ne kêm bû. Li gorî zagonên wan her hefê saetek ziyaret heye û deh deqe te dikarî bi malbatê re telefon biaxiviya, lê em bala xwe didinê vê yekê ji bo Rêbertî nakin.



Bi qasî ku sîstemekî keyfî dihat meşandin, malbatên hevalên derveyî Bakur bi rojan rê de diman û dihatin, wê rojê ji ber xwe digotin ziyatet nîn in. Ya din girtiyên Doza Azadiyê ta dişandin Behra Reş, ji Hekarî dişandin Edirneyê; da ku malbat nikaribe hevdîtinan bike. Di demên dawiyê de piştî Tîpa F niha Tîpa C hatiye çêkirin, di vir de tenê yek kesî digrin, rûxmî ku ev di tu zagonên dinyayê de nîne, ger hebe jî divê rojê 10 saetan bi însanên din re têkilî çêbike. Dîsa mafê girtiyan a xwe perwerdekirin û xwndinê nîne. Bi taybet di salên dawiyê de kirîna rojnameyên ku girtî dixwazin hate rakirin, ji me re yên dewletê dianîn. Her wiha ava germ û ava sar dikin mijara tacîzê û qut dikin, tu girtiye lê pereyê elektrîkê ji te distînin û li hember girtiyan weke çek bikar tînin. Di heman demê de kesên temen mezin 70-80'ê salî yên ku divê bêne berdan, bernadin, her wiha kesên ku nexweşiyên giran pê re hene weke Penceşêr û hwd hetanî ku ber bi şehadetê ve neçe, bernadin. Di heman demê de hevalên gazî jî rastî heman zext û îşkenceya fîzîkî û derûnî tên.

**Bi siyaseta zext û îşkenceyê dixwastin çi bidest bixin û rêfleksa we li hember van polîtîkeyan çi bûn?**

Armanca wan ji her du zextên fîzîkî û derûnî diyar e ku însan bê îrade bikin, boşman bikin û li hember tevgerê bikşînin xiyanetê. Di salên 90'î de ev yek bi îşkenceyê bi heftan û mehan dikirin. Lê di wir de berxwedan bûbû rêgeza jiyanê, bi berxwedaniyê têkoşîn hat meşandin. Ya din di zîndanê de rûyê dewletê a rast derdikeve



holê, her çiqasî li derve banga aştiyê û biratiya gelan bê kirin jî, lê zîndan heqîqeta wan îfade dike. Herî kêm dayîk bi lawê xwe re bi Kurdî biaxive qedexe kirin. Yê ku ev biryar derxist AKP bû û piştî berxwedaniyeke dirêj ku hêşt gav paş de bavêje dîsa AKP bû. Wê demê me nêzî 6 heyvan li deriyan da û weqas ceza dan me.

Piştî pêşketina şoreşê li Bakur û tevahî Kurdistanê, dewletê derfet nedît ku şiddetê wek berê li hemû zîndanan pêk bîne. Di vir de polîtîkeya nerm lê bi heman armancê da destpêkirin. Polîtîkeya nerm ji a şiddetê girantir bû, ji ber bi pîskeolojiya mirov dilîstin. Her wiha ji ber lêdan û îşkence li derve zû teşhîr dibû, êdî kêmkirin. Mînak hin heval şehîd xistin û di bin navê xwekuştinê de ragihandin, hevalên nexweş dibirin nexweşxaneyê, emeliyat dikirin lê bi kelepçe. Her wiha dereng xistina dermankirina nexweşiyan ku piştre xetertir dibû û şehîd diketin. Çend hevalên me wisa şehîd ketin. Bi taybet ji bo hevalên derveyî Bekur ji ber ziman nedizanîn, ew dixapandin û teklîfên bê exlaqî ji wan re dikirin da ku teslîm bibin. Ev polîtîka li ser dayîkan jî dihate meşandin. Bi giştî armanca dagirkeriyê û sîstema girtîgehê çi nerm dibe û hişk dibe, ew e ku te teslîm bike. Em jî şopdarê xeta Mazlûm, Kemal û Xeyriyan bûn ku me ji PKK'ê berxwedanî hîn bûn ne teslîmiyet.

Di zîndanê de rêfleksa me a redkirinê pir xurt bû, em diketin girava birçîbûnê, me li deriyan dida, em dernediketin telefon bikar bînin, me mektûb nedinivîsandin. Ev yek jî li gel wan tiştekî pir girînge, yekane derfeta di destê te de tu bikar nîne û red dikî. Lê dîsa jî ceza didan te, tenê ji bo peyva Pirêz Ocalan, em ceza dikirin û munferîd didan me. Rûxmî me dizanî jî lê me protesto û rêfleks nîşan dida, ji ber ger tu carekê rûmeta xwe ji dest bidî, careke din tu bi dest naxî. A girîng liv û tevgera me a rêxistinkirin û rêxistinbûyîna me dihêşt ku dijmin har û dîn bibe.

**Gelek caran hatiye îsbatkirin ku di girtîgehên Tirkiyê de zagon û mafên girtiyan tên derbaskirin û pêk nayînin. Hûn vê yekê çawa dinirxînin û ji bo bidestxistin mafê xwe yê rewa xebatekî çawa ji aliyê girtiyan ve dihate kirin?**

Zagonên wan di her derê de hene, lê dema mijar dibe Kurd, PKK'ê û Rêbertî tu qanûnan pêk nayînin. Mafê hêviyê di qanûnên wan de heye û li gorî peymana Ewropayê îmze jî kirine; lê heyaî niha Mafê Hêviyê nadin Rêber Apo û nadin hevalên di yên ku heq dikin jî. Di encam de sînorê binpêkirina zagonan nîne, heya ji destê wan tê zagonan derbas dikin û keyîfî nêz zagonan dibin. Bi giştî hiqûq û mafê girtiyan di wir de nîne. Bi polîtîkeya nerm dixwazin van têgînan şîlo bikin.

Di sala 2022'an de zagonek derveyî meşrûiyetê derxistin ku di dinyayê de tiştek wisa nîne. Mînak cezayê ku dane me 30'î sal e, piştî 30'î salî tên ji te pirs dikin "Tu poşman bûyî yan na?" tu poşman nebûye cezayê te dirêj dikin, heya niha jî hevalên ku 35 sal jî di zîndanê de mane hene. Lê piştî 30'î salî ma mumkine em bêjin em poşman bûne! Helbet tu heval viya heyanî niha jî qebûl nekiriye. Li Zîndana Bolo ji ber vê sedemê cezayê 35 hevalan dirêj bûye. Her wiha di zîndanê de mafê parêzeran nîne, her tişt şeklî ye. Biryarên ku divê dadgeh bistîne ku piştî 30'î salî divê girtî bê berdan, di wir de ev yek rêvebirê zîndanê biryar distand û bi tewanên derew cezayên girtiyan zêde dikirin. Ji ber dema em hatine girtin em nehatin darizandin di dadgehê de, di 2018-19'an de biryara Mafê Mirovan a Ewropayê derket ku ev kes bi awayekî adil nehatine dadgehkirin, divê serbest bêne berdan. Çûn ev biryar li ser girtiyên Hizbullah, hizb kontra pêk anîn.

Di zîndanên dagirkeriyê de tiştekî balkêş heye ku zagon û mafên di destê te de û ji te re rewa ne, ji destê te digirtin û piştî ku me red dikir û daxwaz dikir, ew maf didan me weke ku qenciyê bi me dike. Li hember bê mafiya ku dihat kirin me îtîrz dikir lê di 30'î sal û 13 rojan de yek biryar ji dadgehê derneket û negotin hûn mafdar in. Ji wê zêdetir dema em li hember van polîtîkeyan disekinîn ji me re digotin, ka bila niha Gerîla û hêza gel li derve nîn ba, me dizanî me çi bi serê we dikir.

**Piştî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, qaşo gavên erênî ji aliyê dewleta Tirkiyê ve bihatibana avêtin, ev yek ji bo girtiyên siyasî yên di girtîgehan de jî derbasdar e. Lê tê dîtin ku hê jî zext û îşkenceya li wir berdewam dike, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Piştî pêvajoyê tu guhartin çênebû ye, di serî de di rewşa Rêbertî de tu guhartin nebû. Di 23'ê Cotmeha 2024'an de Bahçelî got ku bila Serokatî derkeve bang bike ez PKK'ê fesih dikim, şerê çekdarî didim seknandin, bila di Partiya DEM de biaxive û em ê Mafê Hêviyê bidinê. Serokatî ev hemû kirin lê hîna jî Mafê Hêviyê nedanê. Beriya her tiştî ger di rewşa Rêbertî de tu guhartin ava nebin, wê tu guhartin di pêvajoyê û rewşa hevalên din de jî çê nebin. Ev bû 6 heyvin pêvajo hatiye destpêkirin, lê ew hevalên ku cezayên wan qediya ye, hê jî nehatin berdan.

Biryara serbestberdana wan hevalên ku 30 sal derbas kirine, tu qanûnan jî naxwaze, tenê bila dev ji nêzîkatiyên xwe yêm keyfî berdin. Ger niyetekî wan baş hebe divê ew kesên temen mezin û yên nexweş berdin. Ger Tirkiyê dixwaze ev pêvajo pêş de biçe û naxwaze Tirkiyê perçe bibe divê rast nêz bibe. Heyanî niha dibêje em ê komîteyê avabikin û dereng dixin.

# Siyamend Elî: Çeka QSD'ê hebûn û parastina gelên Sûriyê ye

Berpirsê Navenda Ragihandin û Pêwediyan a YPG'ê Siyamend Elî diyar kir ku balkişandina hikumeta veguhêz a Şamê tenê li ser hêza leşkerî a QSD'ê rast nîne, ji ber pirsgirêkên dîtir û herêmên dagirkirî hene, hem jî xeteriya DAIŞ'ê berdewam e, QSD'ê bi dehê salan e gelên Sûriyê diparêze, lewma çeka QSD'ê hebûn û parastina gelên Sûriyê ye.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê daxwazên hikumeta veguhêz ku hêza QSD'ê çek deyîne û weke kes tevlî artêşa Sûriyê bibe, Berpirsê Navenda Ragihandin û Pêwediyan aYekîneyên Parastina Gel (YPG) Siyamend Elî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Di 9'ê Tîrmehê de şandeyeke leşkerî û siyasî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi hikumeta veguhêz a Şamê re hevdîtin pêk anîn, piştî wê hevdîtinê hate eşkerekirin ku ji QSD'ê hatiye xwestin çekên xwe deyîne û wekî kes tevlî artêşa Sûriyê bibe, hûn vê yekê çawa dinrxînin?**

Rewşa ku niha Sûriyê tê re derbas dibe rewşekî pir hestiyare, bi taybet piştî rûxandina rêjîma Baasê. Pêwîstî heye em jî wê dibînin ku êdî Sûriyê bi rêya diyalog, nîqaş û danûsatandinê pirsgirêkên heyî yên ku bi 10'ê salan nehatine çareserkirin, bêne çareserkirin. Yek ji mijarên bingehîn ku niha ev jî di danûstandinên ku li Şamê têne meşandin, ji hêla Rêveberiya Xweser, QSD û hikumeta Şamê ve.
Di demên dawî de mijarên ku herî zêde xwe dide pêş derbasbûna hêza QSD'ê di nav artêşa Sûriyê de, ew yek ji mijarên bingehîn ku têne nîqaşkirin. Bêguman hinek berovajîbûn di vê mijarê de heye ku dixwazin berovajî bikin, çeka QSD'ê ew hebûna QSD'ê, hebûna gelên Sûriyê û parastina gelên Sûriyê bingeh digre bi vê çekê. Derbasbûna nav artêşê nayê wateya ku em çekê deyînin, ji xwe ku çek nebe, wê demê QSD jî tune ye, pêwîstiya van danûstendin û nîqaşan jî em nabînin. Çekê QSD'ê bi 10'ê salan e gelên Sûriyê ji DAIŞ, komên terror, êrişên derve û hwd… parast. Îro jî aramiyekî ku li ser xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê peyde dibe, ew jî bi saya şehîd û ev çekê ku di destê me de ye. Ji ber wê yekê ev çek dibe parastina gelên Sûriyê, dema ku QSD'ê di nav artêşa Sûriyê de cih bigre, bêguman ev artêş wê xwedî heybet û perensîb be, peresîbiyet û exlaqiyatê ku QSD'ê di cîhanê de her kesî nas kir, wê vê artêşê ya Sûriyê ya netewî wê biser bixe, hem jî wê xwedî rêzgirtinekî hem hundirîn hem jî derve be.

**Di demekê de li seranserî Sûriyê bê aramiyek tê jiyankirin ku tê de kuştin, şer û pevçûn bidawî nebûye, komkujiyên li ser gelê Elewî û Durzî jî vê yekê piştrast dike, di heman demê de gef li ser Kurdan jî didome, li aliyekî din jî xeteriya DAIŞ'ê berdewame, lewam daxwazên ku ji QSD'ê tê xwestin çek deyîne, hûn vê yekê çawa şîrove dikin?**

Kirîza ku niha Sûriyê tê re derbas dibe, bûyerên biêş ên ku di dema nêz de çêbûn, bi taybet mijarên ku li beravê milê Tertoz, Laziqê, Ceblê û bi awayekî giştî, herwiha teqînên ku niha em dibîzin li gelek cihan çêdibe, hem jî êrişên derve ku têne kirin, di heman demê û herî dawî ya herî biêş ku gelê Siwêda rastî komkujiyekê hat. Ev bûyerên bi vî rengî bê baweriyê ava dike, helbet civaka Kurd, Ereb, Ermen, Suryan û hwd… ên ku li ser xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, metirsiyekê bi rûdana van bûyer û komkujiyên han ên ku li herêmên dîtir pêk tên, jiyan dikin. Di bingeh de jî hîn êrişên çeteyên DAIŞ'ê hene, bê çek, bê rêxistinekî leşkerî ewlehî û istxbaratî çawa xwe ji evqas kirîzan derbas bikin, wê demê hebûn û tunebûna vî gelî dikeve nîqaşê de û xeteriyên mezin jî bi xwe re tîne. Gelê kurd jî yê herî zêde êş û azar kişandine ji van êrişan di dîrokê de ku tê naskirin. Ji ber wê yekê gotina çekdanîn, gotinekî ne ji rêzê ye yan jî ne di cî de ye, divê ku em nîqaşê li ser hûrgilî, tevlîbûn û awayê artêşê bikin, herwiha di belavbûna leşkerî de nîqaşan pêş bixin, nêrîn derkevin. Lê kêleka din jî heqîqetekî li ser erdê ye ku niha di hikumeta Şamê de artêşekî heyî nebûye temsîlçiyê giştî civaka Sûriyê, nebûye peresîpên artêşa, em dibînin rojane şer di navbera gropan de hene, rojane pirsgirêkên cidî bi vê artêşê re çêdibin, hem ji esayîşa wê û hem ji artêşa wê. Ji ber wê yekê hîn zûye ku em niha vê bînin ser ziman wek "çek deyînandin" xeteriyên mezin hene, ji ber wê em vê yekê niha guncav nabînin, lê em dikarin vê artêşê jî pêş bixin.

**Piştî banga dîrokî ya Aştî û Civaka Demokratîk a ku ji aliyê Rêber Apo ve hate kirin, gef û êriş li ser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hîn berdewam e, ev tê çi wateyê?**

Piştî banga Rêber Apo û vekirina deriyê çareseriyê û derbasbûna qonxeke nû ji pêvajoyekî nû re, ew roniyek da hemû civakên ku îro di Rojhilata Navîn de jiyan dikin, pirsgirêkên û kirîzên heyî hemû wek roniyeke vê bangê dibînin, da ku ji wê tengbûna van pirsgirêkan derkevin. Helbet di serî de gelê Kurd, Sûriya jî bibandor de, ew bang bandora xwe li ser tevî herêmê kir, yanî îro çareserkirina pirsgirêka Kurd li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bêguman wê bandorekî xwe yê erênî li ser herêma Sûriyê, Îraq, Îran û herwiha herêmên giştî jî bike. Pêwîst e em sûdekê ji vê bangê bikin ku derfeteke mezin a dîrokî ketiye destê gelê vê herêmê de, ji bo em birastî jî biencam bikin û bi armancê xwe biser bikevin, divê em li vê bangê xwedî derkevin. Em jî wek hêzên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rengekî pir cidî em li ser vê bangê disekinin, rêyên çareseriyê, roniyê, danûstendinê, mase û nîqaş wê bingeha hemû têkoşîna me be. Ji ber vê yekê dervî wê na çi hêz an aliyekî ku bixwaze tevliheviyekî derxe, bi êrişekê yan derxistina tevliheviyekê di herêmê de, ew tê wateya ku şer dirêjkirin, pirsgirêk mezinkirin, kurkirin û kirîzên bi vî awayî ên ku 14 salan xelas nebûye li ser xaka Sûriyê, dirêjtir dibe û temenê wê mezintir dibe. Lewma em tim bang dikin ku ev bang û deriyên çareseriyê ku niha li Bakurê Kurdistanê vebûne, em dikarin jê sûd jî bigirin, bi taybet jî weke Kurd di pleya yekem de dikarin pêşengtiya vê bikin.



Heqîqetekî ku niha berê her çavekî li QSD'ê ye, raste QSD'ê îro hêza parastina vî gelî ye, lê gerek em ji bîr nekin ku pirsgirêka me ne tenê QSD'ê ye, pirsgirêk ne tenê artêş e. Hîn li kêleka wê bi dehan pirsgirêk vê civakê hene, pirsgirêkê, çand, ziman, qebûlkirinên destûrî ne, hebûna gelên herêmê di serî de gelê Kurd li ser xaka Sûrî de bi çi awayî be, ev pêwîst e bêne çareserkirin, hiqûq û mafên vî gelî di destûra Sûrî de wê çi bin. Aramî û parastina vê bi çi şêwazî bin, heta çi radeyê dikare biazadî û demokrasî herêma xwe birêve bibin û hwd… Lê dixwazin hikumeta Şamê tenê bal bikşîne ser wek hêza leşkerî, helbet em vê rast nabînin, pirsgirêkên dîtir hene, lê kêleka wê herêmên dagirkirî hene wek Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê ku bi melyona mirovên me bi taybet gelê Kurd ji malê xwe bi darê zorê hatine derxistin, guhertinên demokrafîk li ser xaka Sûriyayê niha hene, ev ewlewiyatên me ya hikumeta Şamê ku pêwîst e van pirsgirêkan çareser bike. Tenê di çarçoveya leşkerî nîqaşkirin ew pir guncaw û rast nine, ji ber wê yekê pêwîst e her koşeyek bal li ser bê kişandin, bi taybet pirsgirêkên dîrokî ku bi sedê salan dirêj kirine. Hejmarekî mezin a gelê Kurd bê nasnameye, bênasnebûyîn wê demê hebûna wî di Sûriyê de nîne ku nikare di bin sîwana vî welatî de jiyan bike, gelo me heta niha ev çareserkirine, heta ku em xwe li ser davêjin û berê xwe didin QSD'ê. Û di cihê QSD'ê de êrişên ku li ser herêmê tên kirin, her kes bi QSD'ê hewcedare. QSD'ê bi vî awayî dikare di nava artêşa Sûriyê de cihê xwe bigre, bi tecrûbeya xwe ya zêdeyî 10 salan dirêj kir berî wê YPG û YPJ'ê ku ev 14 sal in nemûne û tecrûbeyên şer ên herî pispor û pêşketî di destê wê de hene, perensîbên wê yên ku li ser hatine avakirin, perensîbên vê civakê ne. Dikare di artêşa Sûriyê de rolekî pir mezin bilîze di avakirin, pêşxistin, nêzîkatî, rêziknameya wê de û heta di parastin, mijarên ewlehî û istxbaratî de jî wê xurtbûnekê bide vê artêşê. Halê heyî QSD'ê nikare gavek dî bi paş de bavêje û careke din herêmê bixe destê hêzên ku tecrûbeyên wan nînin an hêzên ku guman li ser wan hene. Em bi xwe jî dizanin di hundirê vê artêşê de gelek astengî hene ku bi navên cûda û bi taybet kesên ku radijine beyreqa DAIŞ'ê siloganên bi vî awayî dihildibijêrin, ew ne li gorî perensîbên civaka me ne. Ji ber wê dem û têkoşîn jêr divê ku gav bi gav encex ev pirsgirêk bêne çareserkirin. Di dawî de em dikarin vê bêjin QSD'ê wek hêza leşkerî YPG û YPJ'ê, QSD û hêzên me Asayîş, Ewlehî û Istixbaratî erek û berpirsyartiya me ye ku em niha di van rojên hestyar de gelê xwe biparêzin û astengiyên ku niha li ser me tên ferizkirin, bi rengekî serkeftî em derbas bikin. Da ku rastî jî em aktîv bibin ku di avakirina welatekî wek Sûriya de nenavendî bi demokratîk, pirrengî, hiqûq û edalet bê meşandin, em xwe tê de dibînin û di pêşengtiya wê de jî bi taybet hêzên me leşkerî û rêveberiya me ya xweser dikare rolekî mezin bilîze, ev jî wê bandorekî erênî bi xwe re ji Sûriyê re bîne, ji bo civak û derûberê Sûriyê û danûsetendên wê li ser asta navdewletî.



# Şerê taybet dibe sedema kûrkirina kirîzê

Berpirsê Navenda Kurdî ya Lêkolînan li bajarê Bochum yê Almaniyayê Newaf Xelîl diyar kir ku Şerê Taybet ê ku bi rêya dezgehên ragihandina Şamê tê meşandin ji şerê çekdarî ne qut e û got: "Şerê taybet beşek ji şerê çekdarî ye, pêwîst e mirov dezgehên ragihandinê yên ku cihê baweriyê ne, bişopîne."

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Wekî gelek caran hatiye gotin, pergala dewleta tirk bi temamî pergaleke şerê taybet e. Bi taybetî di welatên ku kirîz û şer lê heye. Lewra aliyên ku naxwazin şer raweste her dem di riya çapemeniyên ragihandinê, bi nûçeyên nerast civakê dixapînin û têkbirina aramiya herêmê armanca wan ya serekeye. Awayê herî xeter şerê taybete ku pêngavên pir bi zerar di nava xwe de dihewîne. Şerê teybet xwedî gelek amûra ye hem bi rêya hunermend, rûspî û siyasetmedaran pêk tê. Ev yek derfetên mezin dide ber van kesan ku ji gel re bibin cihê baweriyê ta ku armanca xwe pêk bînin. Şerê taybet, qirkirina fizîkî ya civakan ji xwe re dike hedef, armanca wê ya sereke nirxên exlaqî, hest û hizira civaka ye.
Li Sûriyê piştî ketina rejîma Esed û desteserkirina Heyet Tehrîr Şam(HTŞ) bi taybetî piştî komkujiyên ku li ser Elewî û Durziyan pêk hat, gelek dezgehên ragihandinê yên girêdayî hikûmeta demikî ya Şamê û gelek rûpelên kesayetan yên qaşo cihê baweriyê ne ji bo berjewndiyên xwe, şerê taybet li ser pêkhateyan didin meşandin. Bi armanca têkbirina aramiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di rêya dezgehên xwe yê ragihandinê û xwepêşandana dixwazin dinavbera pêkhateyên Kurd, Ereb û Surayanan de dijminatiyê derxînin.



Li ser vê mijarê Berpirsê Navenda Kurdî ya Lêkolînan Li bajarê Bochum ya Elemaniya Newaf Xelîl ji rojnameya me re axivî.

**'Jiyana hevbeş ya li Rojava nûçeyên nerast bêbandor dike'**

Newaf Xelîl diyar kir ku her dewletek alavên wê yê şer hene hin jê çek in hin jê dezgehên ragihandinê ne, lewra ji destpêka kirîza Sûriyê û heta niha gelek kenal û ejans di rêya raghindina xwe de, di nava civakê de kirîzê kûrtir dikin û wiha domand: "Gelek dewlet hene ku hê jî naxwazin aramî li Sûrî pêk were, ji bo wê di rêya ragihandinê xwe de nûçe û bûyerên ne rast belav dike. Yek jê ragihandina Qetrî ye, ev yek di navbera civakê de nakokiyan derdixe holê. Lewra ya herî girîn ew e ku, dezgehên ragihandinê yên li Bakur û Rojhilatên Sûriyê ji ber ku ew yên herî çalakin, li ser rûpelên xwe jiyana hevbeş ya di navber pêkhateyan de, piştrast bikin. Lewra ev stratêjiya Rêveberiya Xweser û QSD`ê ye. Ev yek jî di hevgirtina keç û xurtin Kurd û Ereb yên ku li hember dijmin li Bendava Tirşînê mil bi mil berxwedan û gihiştin asta şehadetê jiyana hevbeş tekez dike."

**'Ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk, divê parastina mafê gelê Kurd gava yekê be'**

Newaf Xelîl wiha axaftina xwe berdewam kir: "Di berxwedana Bendava Tişrînê de dîsa ragihandina sereke ya ku nedixwest aramî pêk were û çareserkirin çêbibe dezgehên Qeterî û Tirkî bûn. Tevî ku di şerê navxwyî yê Sûriyê ne tenê pêkhateyek li hember rejîmê serê xwe hilda na, Sûrî bi hemû pêkhateyên xwe li hember dîktatoriya Baees li ber xwe dan. Bi taybetî piştî ketina rejîmê ji ber Siûdiyê roleke girîngtir li Sûriyê dilîst, dewleta Qeter di rêya şerê xwe yê taybet dixwaze tevlîheviyê pêk bîne û aramiyê têk bibe. Herwiha ku hevpeymanên di navbera hikûmeta Şamê ya nû de û QSD`ê de pêk were, wê gava yekê ji bo avakirina Sûriyeke nû û hevbeş wê were avêtin. Lewra parastina mafê gelê Kurd wê ji bo Sûriya nû gaveke dîrokî û avakirina welatekî demokratîk be."

**'Destgeha ku nûçeya nerast belav bike ne cihê baweriyê ye'**

Newaf Xelîl destnîşan kir ku, ta ku mirov bi şerê taybet bandor nebe, divê mirov bizane li kê guhdarî dike û wiha got; "Bandora şerê taybet li ser derûniya mirovan girêdayî baweriya mirov e, carnan ez dihizirim çawa xelek ji destgehekê bawer dike ku bi dehê cara nûçeyên ne rast belav kiriye. Ji bo wê ya girîng û pêwîst ew e ku her kes ji aliyê xwe baweriyê bi dezgehên xwedî bawerî guhdarî bike. Mînak bi dehan ejans û kenalên Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene ku hêjane mirov lê guhdarî bike û ji bawer be. Çimkî di berxwedana Bandava Tişrînê de ev yek diyar bû ku çawa rojemavan ji bo pêşkêşkirina bûyerên rastrset ragihînin, bi têkoşîn li ser bendavê li be xwe dan, heta hin ji wan gihiştin asta şehadetê. Heta niha ragihandina girêdayî hikûmeta demikî ya Şamê dev ji axaftinên xwe yê dijî pêkhateyan nesekinandine nûçeyên xwe yê derew nesekinandine. Ji bo wê hêviya me ji gel ew e ku, ne guhdarî van kenalan bike ne jî derbasî rûpelên wan bibe, lewra guhdarkirina mirov ji wan re dibe hêz divê gel ji vî aliyî ve baldar be."



**'Şerê taybet beşek ji şerê çekdariye'**

Berpirsê Navenda Kurdî ya Lêkolîna Li bajarê Bochum ya Elemaniya Newaf Xelîl li ser rawestandina nûçeyên nerast axaftina xwe wiha bidawî kir: "Şerê taybet yê di rêya ragihandinê de tê bikaranîn, beşek ji şerê çekdariye. Mirov hizrê xwe bide dewlet û hêzên mezin ji bo avakirina dezgehên ragihandinê çiqas pereyan terix dikin. Ji bo wê di rewşeke wiha hestiyar de ya herî girîng ku ji ragihandinên li Bakur û Rojhiilatê Sûriyê tê xwestin, şopandina hemû nûçeyan û derxistina rastiya li ser erdê ye. Têrênakê ku bêjin em xwedî mafin, şêweyê derxistina mafê xwe girînge. Ji bo parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava jî ev yek pir girîng e.

## Gelo hikumeta Şamê yan Tirkiyê dê li ser masa Parîsê be?



**Zekî Bedran**

Qaşo HTŞ'ê dê hilbijartinên parlemanî li dar bixe. Her çend ji wan re hilbijartin tê gotin jî, divê ev wekî vesazîyên ji hêla HTŞ'ê ve werin dîtin. Ew ji bo ti hilbijartinan amadekariyê nakin. Wan bi xwe îdîa kir ku ew dikarin tenê piştî 5 an 6 salan hilbijartinan li dar bixin. Gelek koman li dijî vê yekê derketin û gotin ku pir dirêj e. Digotin ku destûrek dikare di salekê de were nivîsandin. Qanûna hilbijartin û partiyên siyasî dê were nivîsandin, û dûvre hilbijartin dê di sala duyemîn de werin lidarxistin. HTŞ hewl dida ku hilbijartinê asteng bike û bi derengxistina wê serweriyê bi dest bixe.
Niha wan heman komkujiyên li dijî Durzîyan kirine li dijî Elewiyan jî kirine. Li her çar aliyê cîhanê bertekên cidî derketin holê. Kongreya Amerîkayê gav avêtiye. Rakirina dorpêçên li ser Sûriyê derfet bû û şert û merc hatin guhertin. Her çend wêneya wan di cîhanê de jixwe tarî bû jî, wan komkujiyek din lê zêde kir û her kes tirsand.
Diyar e ku wan hişmendiya El Qaîde û DAIŞ'ê terk nekiriye. Li şûna ku pergalek demokratîk û berfireh ava bikin, wan bi qirkirin û bindestkirina hemû pêkhateyên herêmê xwestin desthilatdariya xwe xurt bikin. Ger bingeha girseyî di Sûriyê de qels be, aborî di rewşek xirab de be û pergala dewletê hilweşiyabe wê hingê jî, ew serî li komkujiyan didin, gava ku ew serweriyê ava bikin û desthilatdariyê bi dest bixin, ew dikarin çi bikin?
HTŞ di bikaranîna tundiyê li dijî beşek girîng a welatiyên Sûriyê de ti zirarê nabîne. Ew hewl didin bi bikaranîna tundiyê û terorê li dijî kesên ku mîna wan bawer nakin an jî xwedî nêrînên cuda ne, pêş bixin.
Dewleta Tirkiyê di rê de piştgiriyek bê şert û merc pêşkêşî wan dike. Piştî ku wan li Îdlibê perwerde û amade kiriye, DYA hem piştevaniyê dide wan û hem jî hewl dide ku wan li ser piyan bihêle. Welatên mîna DYA, ku ti vebijêrkek din nemaye, dixwazin ku HTŞ di desthilatdariyê de bimîne. HTŞ jî dizane ku ew nikare bê piştgriya DYA û Îsraîlê di desthilatdariyê de bimîne. Ji ber vê yekê, DYA bandora xwe zêde dike û hewl dide ku HTŞ amade bike ku Peymanên Îbrahîm îmze bike. Ji ber ku pêşîniya HTŞ desthilatdariyê mayin e, ew razî dibe bi van hemî hêzan. Lê bingeha wê ya rastîn û hêza ku hebûna wê misoger dike Tirkiye û Ingilistan e.
Piştî komkujiya Durziyan, HTŞ derbeyek giran li hebûnaa xwe xist. Ji bo ku dem qezenc bike û rojevê biguherîne, hilbijartinên parlementoyê anî rojevê.
Daxuyaniyên li ser hilbijartinan bi tevahî bê cidiyet in. Li gorî agahiyan, parlemento dê ji 210 nûneran pêk were, ku 70 ji wan dê ji hêla Ehmed Şeraa ve werin vesazkirin. Gel parlementeran hildibijêre, lê Şera wekî xwedîyê vîna ji gel bilindtir tê nîşandan. Heta Partiya Baas jî newêribû hilbijartinek wisa li dar bixe. Hilbijartin ne zelal bûn, di hawîrdorek wekhev û azad de nehatin lidarxistin. Lê dîsa jî, wan daxuyanî dan ku gel parlementeran hilbijartine, heta didan xuyakirin jî. Ew nikaribûn bibêjin ku Beşar Esed bêyî hilbijartinek ewqas parlementer vesaz kiriye.
Di heman demê de, hewl tê dayîn ku li Sûriyê aloziyê biafirînin. Tirkiye ew dewlet e ku pir caran îdîa dike ku li Sûriyê aramî û aştî dixwaze. Lê ew jî Tirkiye ye ku herî zêde di Sûriyê tevlihev bike û wê bixe nav şerê navxweyî. Sedema bingehîn a vê yekê dijminatiya li dijî Kurdan e. Hevsengiya hêzê li herêmê guheriye. Tirkiye behsa pêvajoyek biratiyê bi Kurdan re dike, lê ew Tirkiye ye ku hewl dide ku rê li ber Kurdan bigire ku li Sûriyê statuyek bi dest nexin an rêxistin nebin. Niha, ew HTŞ'ê neçar dike ku li dijî QSD û Rêveberiya Xweser tedbîran bigire. Ew hewl dide ku eşîrên li herêmên Ereban gur bike û hawîrdorek pevçûnê biafirîne. Di vê hawîrdora pevçûn û aloziyê de, ew plan li pey planan diafirîne da ku Kurdan qir bike, destkeftiyên wan hilweşîne û wan ji hev belav bike.
Ew li ser vê mijarê bi Tom Barrack, nûnerê taybetî yê DYA yê Sûrîyê, re bi berfirehî dixebitin. Ew hewl dide ku QSD di nav artêşa Sûriyê de entegre bib e û Rêveberiya Xweser hemî rêxistinên xwe ji hev belav bikin û radestî hikûmeta Şamê bikin. Barrack, mîna nûnerê hikumeta AKP'ê, li dora xwe digere û dibêje, "Yek hikûmet, yek artêş, yek dewlet." Ev zimanê parastin û piştgriyê, zimanê Tirkiyê ye. Yên ku li Rojhilata Navîn dijîn vê yekê baş dizanin . Ji bilî vê, kengî Kurd û Ereb û gelên Suryanî-Asûrî yên ku ew bi wan re dijîn gotine, "Du artêş, du dewlet, du hikûmet?" Ma bernameyek an daxwazek wisa heye? Tiştekî wisa tune. Her gava ku Kurd li maf û statuyê digerin, dewleta Tirk sed sal e li dijî wan pankartek bilind kiriye û wan wekî "cudaxwaz, veqetîner" îlan kiriye. Ew ji hişmendi û çanda guhdarîkirin, fêmkirin û pejirandina mafên Kurdan dûr in. Ev ji tiştê ku ew li ser Sûriyê ferz dikin û hewildidin Kurdan ji Sûriyê derxin. Li Parîsê di navbera hikûmeta Şamê û Rêveberiya Xweser de dê danûstandin bên kirin. Divê gelê Kurd û hêzên demokratîk bizanin ku Tirkiye bi xwe, ne hikûmeta Şamê, dê li hember wan li ser maseyê rûne.